

DEYNÊ MELZEMEYÊN MALÊ

C S N F A K T A B L A D 2 0 1 0 N O R D K U R D I S K A / K U R M A N J I

KÎ DIKARE DEYN BIKE Û JI BONA ÇI?

Penaber û hin biyaniyên din yên ko bar dikine xaniyekî, ew dikarin deynê melzeme-yên malê ji xwe re bixwazin. Da ku tu deyn bigirî, pêdivî ye; ku tu di nav wergirtina penaberên komûnê de bî û 18 salî bî, dema ku tu cara pêşîn ji aliyê komûnekê ve hatibûyî wergirtin.

Tu dikarî deyn bigirî ger tu bar bikî xaniyekî raxistî an ne raxistî, an ger tu di nav malekê de rûnî. Deyn ji bona kirîna; bo nimûne melzeme-yên aşxaneyê û mobîliyayê ye. Nabe ku tu wan pereyan bo nimûne ji bona xwarin û kirê bi kar binî.

KENGÎ EZ DIKARIM DEYN BIKIM?

Pêdivî ye, ku xwestin di nav du salan de ji roja pêşîn de ku komûnek te werdigirî de bête kirin. Ev yeka han ji bona serte-mamkirina xwestina deyn jî berdeyam e.

EZ DIKARIM ÇI QASÎ DEYN BIKIM?

Mezinbûna deynê ku tu dikarî bigirî bi mezinbûna kulfet, xanî raxistî ye an ne raxistî ye, bi hatinên te ve girêdayî ye. Tu dikarî hertim meblexa biçûktir ne ya mezintir deyn bikî.

Hejmara kesan	Ne raxistî Meblexa mezintir bi kronan	Raxistî/ navmalê
1	15 000	5 000
2	20 000	5 000
3	25 000	5 000
4	30 000	5 000
5	35 000	5 000

EZ ÇAWAN BI XWESTINÊ RADIBIM?

Dan û standinê bi berpirsiyarê xwe re li kampê an bi cihê wergirtina penaberan yê komûnê re dayîne. Ew aliyê te bi agehdariyê û dagirtina daxwaznameya deyn dikin. Paşê berpirsiyar daxwaznameyê ji komîteya piştgîriya xwendinê ya navendî (CSN) re bi rê dike.

MA EZ DIKARIM BI SER DEYNÊ XWE YÊ BERÊ VE DEYN BIKIM?

Tu dikarî bi xwestina serzêdekirin/sertemamkirina deynê berê ve rabî ger

- te berê meblexeke kêmtir deyn kiribû û dixwezî meblexa bilindtir deyn bikî ya ko li gor mezinbûna kulfet û xaniyê niha ye.
- kulfet dikare li ser zarokên ku li Swêdê dibin bigire
- tu ji xaniyekî raxistî bar dikî xaniyekî ne raxistî
- xizmên nêzik yên ko di nav wergirtina penaberên komûnê de ne, ew jî hatin.

Xizmên nêzik mêt/jin/hevcot û zarokên din yên ko di bin 21 saliyê re ne. deynê mêt û jin/û hevçotan bi hev ve tê qebûl-kirin (tevî ku du sal di ser tarîxa wergirtina pêşîn re jî derbas bibin).

Ji bona mêt û jin/û hevçotan di serzêdekirina deyn de; hûn bi hev re ji dandina hemî deyn berpirsiyar in.

XERCA SERDANÎNÊ

Ji meblexa qebûlkirî awtomatikî xercede serdaninê 300 kron tê dabirin. Ji bona deynên sertemamkirinê xerca serdaninê 100 kron e.

ÇAWAN DANDIN ÇÊ DIBE?

Girtina deyn di riya Swedbankê re çê dibe. Dibe ku pere bi du awayên têvel bêne dandin:

- Dandina kerta Swedbankê. Ew cureyekî çekan e, tu wî li bal Swedbankê hûr dikî.
- Bi kontoyê. Dibe ku ew kontoyek be li Swedbankê an li bankeke din be.

Ger tu bixwazî pereyên te têkevin kontoyê, pêdivî ye; ku tu bi xwe kontoyê bi sistema dandina Swedbankê (SUS) ve girê bidî.

Ger hûn hevgrêdana kontoyê di dema dandinê de temam nebûbe, an li cem Komîteya Piştgîriya Xwendinê ya Navendî (CSN) numreya kesîn ya tam tune be, hîngê pere di riya dandina Swedbankê re tene dandin.

KENGÎ DIVÊ DEYN BÊTE VEGERANDIN?

Vegerandina deyn ji meha ku du sal di ser dandina pêşîn re derbas dibin re dest pê dike.

Mêt û jin an hevçotên ku ji wan re deynê melzeme-yên malê bi hev re tê qebûl-kirin, ew bi hev re ji vegerandina hemî deyn berpirsiyar in.

PARVEKIRINA DEYN

Komîteya Piştgîriya Xwendinê ya Navendî (CSN) di dema hevberdanê an cudabûnê de; ger herdu deyndaran li hevdu kiribe; dikare deyn parve bike. Hîngê deyn bi qasî hev tê parvekirin û nabe ku ew hewaleyî ser yekî ji deyndaran bibe. Divê xwestina deyn-parvekirinê bi nivîskî ji Komîteya Piştgîriya Xwendinê ya Navendî (CSN) bête xwestin.

Zemanê vegerandinê di navmêra 1 - 15 salan de ye, ew bi pîrbûna deyn ve girêdayî ye.

	Sermiyanê deyn	Zemanê vegerandinê
<	10% ji meblexa bingehîn	1 sal
<	40% ji meblexa bingehîn	3 sal
<	80% ji meblexa bingehîn	5 sal
<	100% ji meblexa bingehîn	7 sal
<	110% ji meblexa bingehîn	8 sal
<	120% ji meblexa bingehîn	10 sal
>	120% ji meblexa bingehîn	15 sal

(Meblexa bingehîn ji bona sala 2010 an 42 400 kron in)

ÇAWAN FAYÎZA SER DEYN TÊ HEJMARTIN?

Fayîz ji aliyê hikûmetê ve her sal tê danîn. Ew ji roja ku deyn cara pêşîn hatiye dandin de fayîz tê hejmartin. Roja ku tu mecbûrî deynê xwe bidî, yekûna fayîza du salên pêşîn ku dandin azad bû, ew dikeve ser deyn. Piştî wê fayîz herdem dikeve ser yekûna meblexa nuh. Fayîz di nav sala 2010 an de 4,9 prosent e.

ÇAWAN DEYN TÊ DANDIN

Normal deyn her meh tê dandin. Tu her sê mehan carekê sê kertên dandinê digirî (her yek ji bona mehekê ye). Xercede dandinê salê çar caran 25 kron tene birin. Ger pere di roja dandinê de negihînin komîteya piştgîriya xwendinê ya navendî (CSN); ew bi bîrhanînekê meha piştî wê bi rê dike. Xerca bi bîrhaninê 50 kron e.

Di dema dandinê de li pêşiyê xercên nedayî jê tene dabirin, paşê fayîz û li dawiyê dandina deyn e.

DANDINÊN BI DILÊ XWE

Da ku deyn zûtir bête saxkirin mirov dikare dandinên bi dilê xwe bide. Dandin li ser vê numreya *bankgîroyê 5201 - 1053* an li ser vê numreya *plus-gîroyê 476 51 01 -3* çê dibe. Numreya deyn û numreya kesîn li gel nav û navnîşana xwe li ser kerta dandinê binivîsîne. Ger tu bixwazî di riya internetê re reyan bidî, pê divî ye; ku tu numreya OCR bi kar binî, ew ji komîteya piştgîriya xwendinê ya navendî (CSN) tê xwestin.

GER EZ NIKARIBIM BIDIM

Ger tu ji ber kêmbûna hatina xwe nikaribî deynê xwe bidî, tu dikarî yekcar li paşxistinê (rawestandinê) an kêmkirina dandinê bixwazî. Blanketa li paşxistinê awtomatîkî bi kertên dandina pêşîn re tê bi rêkirin.

Di dema xwestina kêmkirinê an li paşxistinê de; Komîteya Piştgîriya Xwendinê ya Navendî (CSN) mezinbûna kuflet û yekûna hatinê ya ko bac li ser tê birin bi berçav digire.

Fayîz heyanî ku deyn sax dibe tê ser deyn, tevî ku kêmkirin an yekcar li paşxistin ji bête pejirandin. Ger yekcar li

paşxistin ji te re bête pejirandin; deynê te dê pir bibe.

Ger tu li derveyî welêt rûniştibî, qaideyên din yê li paşxistinê berdewam in. Agehdayên nêzîktir ji Komîteya Piştgîriya Xwendinê ya Navendî (CSN) têne xwestin.

Kêmkirin an li paşxistin her sal carekê tê qebûl kirin.

MA DIBE DEYN BÊTE RESÎTKIRIN

Resîtkirina deyn ji aliyê kesên ku di ser 65 saliyê re ne an yê ko ji ber nexweşiyê an seqetbûnê ve ew hatine hukumkirin ku tucarî bi kêrî kar nayên tê xwestin.

Di dema mirinê de ji ber xwe awtomatîkî deyn tê resîtkirin.

GUHARTINA NAVNÎŞANÊ

Ger tu di nav Swêdê de bar bikî, divê navnîşana nuh li bal kutikê nifûsa gel bête qeydkirin.

Baştir e, ku tu haya komîteya piştgîriya xwendinê ya navendî (CSN) jî jê bikî.

Pêdivî ye, ku tu navnîşana nuh li derveyî welêt li bal komîteya piştgîriya xwendinê ya navendî (CSN) bidî qeydkirin.

Kerta navnîşanê li bal komîteya piştgîriya xwendinê ya navendî (CSN) heye û tê wesandin.

AGEHDARIYA PIRTIR

Agehdayiya pirtir ji aliyê: Komîteya Piştgîriya Xwendinê ya Navendî ve (CSN) tê dayîn
Hemutrustninglån
851 82 Sundsvall.
Telefon: 0771-276 100
Dema telefonê: 9.00 - 12.00
Telêfaks: 060-18 60 06
E-post: hemutrustningslan@csn.se
Webbplats: www.csn.se

Ev kezeza rastiyên li ser van zimanan hatiye wergerandin: albanî, erebî, îngilîzî, frensî, kurmançî, farisî, qereçî (romanî), romanî, rûsî, BKS, somalî, spanî, soranî, tîgrînî, tirkî, vîtnamî û badînanî. Ji bona wergerandinê Semantix bersivê dide.

